Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(74) Hizêran 2007 z~2619 k Buha (15) p.s

50-î Saliya avakirina rêxistina siyasî a kurd a yekemîn li Sûriyê

Sînorê Yekta

Li 14-ê Hizêrana 1957-an , li bajarê Helebê civateke dîrokî ji heft camêran dihate lidarxistin , tê de , biryara damezrandina partiyeke siyasî û demokrat di nav kurdên sûriyê de erê dibû . Ew heft camêr jî evên he bûn: Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Hemîd Derwîş, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed, Şewket Nesan û Hemze Niwêran. Û hêjayî gotinê ye ku , qonaxa ji berî 1957-an , bi çalakiyên hinde komeleyên rewşenbîrî û civakî hatibû zengînkirin , digel rola derçûna kovara Hawarê li ser destên bedirxaniyan li Şamê û belavbûna hejmarên wê di nav xwendekarên kurd de .

Piraniya xelkê li seranserî herêmên kurd berê xwe didane vê partiya nû , û bi dilgermî jê re dibûne alîkar û piştgir.

Kêm-zêde piştî salekê ji aşkerekirina damezrandina partiyê , herdu camêrên navdar Dr.Nûredîn zaza û helbestvanê gelêrî Cigerxwîn (Mile Şêxmûs) derbazî nav rêzên rêxistina partiyê dibin û dibine egera ku hê bêtir rola partiyê di nav gel de geş bibe û bêtir ciyê xwe bigre.

Karbedestên dewletê bi diltengî û çavsorî li liv û hebûna vê partiya kurdan dinihêrîn û tevdîrên tund li dij distandin , dixwestin ji hev bişelînin , ji hev bixin û ji ortê rakin , lê nikarîbûn . Ji ber ku ne tenê rêxistineke siyasî bi rêvebiriya çend ronakbîran bû û hew , lêbelê bûbû rêxistina gel , partiya civaka kurd , partiya xwendekaran, ya cotkar û gundiyan , ya hinde mile , şêx, axa û began , ya xortan , mêr û jinan , partiyeke netewî kurdhez û demokrat bû , lewre jî berdewam dibû û dijî , tevî ku bûyer û qonaxên ku tê re derbaz bûye bi êş û zor dijwar bûn , nemaze ji hevcudabûn , **D.R (12)**